

72 saliya şehîdbûna lîderê kurd  
**Simkoyê Şikak**

(1887 Kela Çariyê- 30.06.1930 bajarê Şino)



Kakşar Oremar  
[navdarenkurd@hotmail.com](mailto:navdarenkurd@hotmail.com)

[www.amude.com](http://www.amude.com)  
[info@amude.com](mailto:info@amude.com)

Heya niha li ser kesayetî, nîrx û eymetên Kurdan yê dîrokî, dagirkerên Kurdistanê li gor berjewendiyên xwe yê siyasî, civakî û aborî çî tiştê ku xwestine, nivîsandine. Ji ber ku xwediyên hemû îmkanên diravî jî bûne, ew nivîsên xwe li her derê belav kirine. Wan bi dilgemariyên xwe yê şovînistî, hemû pîrensîbên exlaxî bînpê kirine û xwestine ku rûpelên dîroka serhildan û şoreşên Kurdan, berevajî rastiyan wan bi nîfşên piştî xwe bidin nasandin. Di vê navê de dîroknivîsên ku hertim di xizmeta sîstema serdest de bûne, serok û qehremanên Kurd weke xayîn, talankar, diz û sîxor bi nav kirine. Di berhemên wan de Şêx Seîdê Pîran, Pêşewa Qazî Mihemed, Simkoyê Şikak, Seyîd Rizayê Dêrsimê, Şêx Mehmûdê Berzencî, Mistefa Barzanî û hemû qehremanên ku bîngeha siyasiya xebata Kurdan darijandine, xayîn û xûlamên hêz û dewletên biyanî tînen hesabandin.



Mixabin zêdetir ji dîroknivîs û lêkolînavanên Kurd, nivîskarên nîfşparêz ku pênuşa wan hertim di xizmeta desthilatdar (hakim) û dewletên navendî de bûye û li gor nîrxê rojê nan xwarine, li ser dîrok û jiyana kesayetiyên Kurd nivîsandine. Bi awayekî ku armanca wan ya herî mezin bê bîngeh nîşandayîna şoreşên Kurdan yê azadîxwaziyê û serxwebûna Kurdistanê bûye.

Îsmail Axayê Şikak yê ku pîranî bi navê (Simko an jî Simkoyê Şikak) di nava Kurdan de hatiye naskirin, yek ji wan rêberayê ku di dîroka azadîxwaziyê gelê Kurdistanê de xwedî rûmet û xebatek berçave. Girîngiya serhildana Simkoyê Şikak ku nêzî 25 salan domkir, di vê rastiye de ye ku piştî şerê cîhanê yê yekemîn nêzî %50 ji axa rojhilatê Kurdistanê li jêr desthilatdariya dewleta navendiya Îranê rizgarkir û mîna desthilatdarekî Kurd

*Simkoyê Şikak li ber derê kela Çariyê.* karê xwe yê hukimdariyê dimeşand. Ev karê han (ku Simko karî hemû hêzên êl û eşîretên Kurdan li dora hev bicivîne), di wê serdema ku sîstema feodalîzmê li hemû Kurdistanê di bin nîrê axatiyê de bû, karekî wiha hêsan nebû. Di vir de ezê tenê bi awayekî kurt li ser çend xalên girîng yê nasandina malbat, kesayetî û şoreşa Simkoyê Şikak bisekinim:

## 1. Şecerename û Nasnameya êla Şikak

Şikak di Rojhilatê Kurdistanê de piştî eşîreta Kelhûr (li herêma Kirmaşan), mezintirîn eşîreta vê para axa Kurdistanê ne ku di çaxê desthilatdariya Qacarî û Pehlewîyan de li Îran û Kurdistanê xwedî rolekî aktîv yê siyasî bûne.

Piştî ku Mihemed Xanê Qacar (damezrînerê silsîleya Qacariyan) bi ji navbirina desthilatdariya Zendîyan, desthilatdariya hemû Îrana mezin girt destê xwe, fermandarê Kurd Sadiq Xanê Şikak jî hevkarê wî bû. Lê Mihemed Xanê Qacar zor û sitemkariya xwe gehand radeyê ku heta li dijî mirovên mîna Sadiq Xanê Şikak jî ket liv û lebatê û hewilên ji navbirina wî jî dane. Sadiq Xan ku xwedî hêzeke zêdetir ji 10,000 kesên bûye, bi kuştina Mihemed Xanê Qacar jî hatiye tawanbar kirin ku di sala 1797ê zayînî de li bajarê Şoş di nava xîveta xwe de tê kuştin(1). Sadiq Xanê Şikak yekemîn kesê ku navê wî di serûkaniyên dîrokî de weke fermandarekî Kurd yê girêdayî êla Şikak hatiye nivîsandin. Piştî wî malba Simkoyê Şikak di qada siyasî ya herêma bakurê rojhilatê Kurdistanê de, xwedî navekî xuyakirî ne. Ji wan kesayetiyên

Îsmaîl Xanê Mezin, Cazê (jina Îsmaîl xanê mezin û dayika Elî Xan), Elî Xan, Mihemed Paşayê kurê Elî Xan, Cewer Axa û Simkoyê Şikak ku tev bi nemerdî û awayê xapandinê ji aliyê Îraniyan ve hatine kuştin.

Êla Şikak ji du tîreyên (Kardarî û E'bduyî) pêk tê. Tîreya Kardaî ji deh şaxên (Fenekî, Mamedî, Nîsanî, Delan(Delanî an jî Delî), Xidirî, Botan, Hinare, Pisaxa, Gewirik û Xelûfan) pêk tê.

Tîreya E'bduyî jî ji van şaxên jêre pêk tê:

Kizinî, Keçelî, Pisaxa(malbata Simkoyê Şikak), Etmanî, çerkoî, Mendolekî, Neimetî, Êverî û Şekerî.

Ji van her du tîreyan tev di bin desthilatdariya (Pisaxa)yan de bûne ku di çaxê serhildana Simkoyê Şikak de û di bin rêbertiya wî de, bi awayê konfederasyona eşîretan hevgiretînek bihêz di navbera eşîreta Şikak, Herkî, Ertûşî, Dirî û ... hat çêkirin.

Mîna ku mezin û rihspiyên e'şîreta Şikak didin diyar kirin, esilê wan ji Cizîra Botan hatiye û navê yekemîn kesê vê malbatê Ebdû bûye ku bi neh kurên xwe re ji wir ber bi hêrêma Urmiyê û Soma Biradost koç kirine. Min sala 1993'an hevpeyvînek bi apê Evdî re çêkir. Ew şervanekî çaxê şoreşa Îsmaîl Xan bû ku heya roja şehîdbûna wî li bajarê Şinoyê, pêre bû. Apê Evdî li ser koka malbata Simaîl Xanê Şikak wiha dibêje:



*Simko bi çend axayên eşîreta Ertûşî re ku hevkarên wî bûn*

*Ebdula beg(Ebdu an jî Evdu) xwediye neh kuran bû ku ji Cizîrê hatin Somayê. Kurekî Evdu begê yê bi navê Îbrahîm Axayê çep hebû ku pir mêrxas bû. Ji wî re kurek çêbû ku jêre Simail Axayê Mezin digotin. Yanî bapîrê mezin(bavê bapîr)ê Simkoyê Şikak bû. Elî Xanê kurê Simkoyê mezin xwediye 6 kuran bû: Ehmed Axa, Mihemed Axa(Bavê Simko û Cewer Axa), Temer Axa, Îbrahîm Axa, Hecî Axa û Qasim Axa. Mihemed Axa jî xwediye 6 kuran bû: Cewer(Ceifer) Axa, Simaîl Axa(Simko), Şukir Axa, Ehmed Axa, Xurşîd Axa(di şerê bi Asûriyan re li Dîlemanê hat kuştin) û Elî Xan( di çaxê şandina bombeya ku ji aliyê dewleta Îranê bi navê şirînî ji bo kuştina Simko hatibû şandin, li çariyê şehîd bû)."(2)*

Di Rojhilatê Kurdistanê de ji çaxê serhildana Kela Dim-dim heya roja îro, hemû rêberên Kurd bi navê çareserkirina pirsgerêka Kurd û hevdîtinê, hatine xapandin û di bi awayekî dûr ji exlaqê siyasî û mirovanetiyê ji aliyê desthilatdarên Îranê ve, hatine kuştin.

Ji serokên êla Şikak Simkoyê Mezin(Îsmaîl Xan), Elî Xan, Cewer Axa û Simkoyê Şikak tev bi navê hevdîtin û çareserkirina pirsgerêkên siyasî bi nemerdî ji aliyê desthilatdarên Îranî ve hatine kuştin. Mihemed Axayê Şikak jî piştî kuştina kurê wî (Cewer Axa) çû Istembolê ku ji sultanê Osmanî (Sultan Ebdulhemîd) dawa hevkarîyê ji bo tolhildana xwîna kurê xwe bike. Li wir rêzek taybetî jêre hat girtin û nasnavê (Paşa) dan wî. Lê bi hewldanên berdevkên Îranê, Mihemed Axa negehişt armanca xwe û wek jêder didin xuyakirin ew li Istembolê bi komployekê hatiye kuştin. An jî ji ber təkeliyên wî yê bi malbata Bedirxanî û mezinên din yê Kurd li Istembolê, ji wir hatiye dûrxistin û di jiyana dûrî Kurdistanê wefat kiriye.

## 2. Kuştina Cewer(Ce'ifer)Axa û destpêka serhildana Simkoyê Şikak

Cewer Axa ku di nava êla Şikak de wek cîgirê bavê xwe dihate hesabandin, bi awayekî fêrmî bi destûra dewleta Qacarî li herêmên rojavayê gola Urmiyê hukimdarî

dikir. Cewer Axa ji ber hinek taybetmendiyên xwe yê mîna mêrxasî, merdayetî û destvekiriyê di nava çîna feqîr û hejara herêmê de pir dihat hez kirin. Sedem jî ew bû ku wî parek ji wê talana ku ji dewlemendan distand, di nava feqîr û hejara de belav dikir. Ji bona wê jî Cewer Axa ji aliyê jêredên Ewropî û gerîdokên Rojavayî ve wek (Robîn Hoodê Kuran) hatiye binav kirin.

Sala 1905an dema ku Muzfereddîn Şahê Qacar, bi sefer çû Ewropayê, li bajarê Tebrêzê kurê xwe Mihemed Eçlî Mîrza wek cîgirê xwe hîlbijartibû. Wê demê Huseyin Qulî-Xan(Nizamûl Seltene) jî kiribû waliyê giştîyê Azaerbayicanê(3).

Dîroknivîsê Azerbayicanî Ehmed Kesrewî di vê derbarê de dibêje: “ *Nizamûl Seltene bi awayekî fêrmî Ce’fer Axayê Şikak vexwînd bajarê Tebrêzê û jê dawakir ku ji bo gotûbêja li ser pîrsgirêkên sinorê dewleta xwe û dewleta Osmanî bi hev re bişiwirin. Herwiha wan soz da Ce’fer Axa ku dewlet yê li wî xweş be û daxwazên wî jî yê bîn cî bi cî kirin. Lê piştî ferman da Mihemed Husên Xanê Zerxam(Qeredaxî) ku Ce’fer Axa vexwîne bo seraya xwe û bi awayekî ku ew pênehesin, wî û mirovên pêre bikujin...“.*



Havîna sala 1905’an piştî ku Cewer Axa bi mezinên êla xwe re şiwirî, di gel heft siwarên xwe yên ku di karê şervanî û mêrxasîyê de zîrek û netirs bûn, ji kela çariyê ber bi bajarê Tebrêzê meşyan. Heft kesên hîlbijartî ku bi Cewer Axa re çûn ev bûn:

Mistefa Newrozî(Xalê Mistê), Xalê Mîrzê (xalê Cewer û Simko), Sedo, Hacî(Haco), Caço, Seyîd Mihemed(Seydo) û Qasim(Qaso).

Piştî 40 rojan ji aliyê welîehdê Îranê(Mihemed Elî Mîrza) ve fermana kuştina Cewer Axa bi telegrafekê, gehişt destê Nizamûl Seltene û ew di seraya dewletê de hat kuştin. Ji heft kesên ku bi Cewer Axa re bûn, pênc kesan karî bi şerekî giran xwe ji bajarê Tebrêzê bigehînin kela çariyê û xebera bûyerê bigehînin Kurdên herêmê. Mihemed Axa ji bo tolhildanê bi rîya Sultan

*Cewer Axayê Şikak ku li sala 1905an de li Tebrêzê hat şehîdkirin*

Ebdulhemîdê Osmanî çû Istembolê, lê nekarî raya wan ji bo vî karî bikişîne aliyê xwe. Wek hat gotin ew bi kompoyên konsulosê Îranê, êdî ji Istembolê venegerî

Kurdistanê û bi her awayê ku bû, hat wenda kirin.

Kurdan ku bi şeweyek aktîv di şoreşa meşrutexwazên Îranê(1905- 1911) de, xebat dikirin, ji vî karê Nizamûl Seltene nerazîbûna xwe dan xuyakirin. Herwiha azadîxwazên din yên Îranî li bajarên mîna Tebrêz û Tehranê jî ev karê dewleta Îranê şermizar kirin.

Di vir de pêwîste rastiyeke dîrokî li ser bizava Kurdên rojhilatê Kurdistanê neyê ji bîrkirin ku ji aliyekî pîrsgirêka netewî di navbera Kurd û gelê serdest de hebûye (heta roja îro hê jî heye) û ji aliyekî din jî pîrsgirêka olî(cudabûna mezheb) hertim di navbera Kurd, Faris û Azerîyan de nakokiyên siyasî û civakî afirandine. Dewleta navendiya Îranê ji çaxê Sefewîyan heya roja îro mezhebê şîî’iyê weke amrazekî giran ji bo meramên xwe yên siyasî li dijî xwestekên gelên din yên ku di Îranê de dijîn û bi mezhebê xwe Sûnîne, bikar anîne. Herwiha şîî’î ji wan re mîna dîwarê parastina sinorên wan yên desthilatdarî û e’rdnigarî(jeografî)yê bûye. Azerî yên şî’îe ku ji çaxê Sefewîyan heya roja îro ji aliyê dewleta navendî ve weke gelê desthilatdar di herêma Urmîyê de hatine bi cîhwar kirin, li hemberî pîrsgirêka Kurdan ya netewî ji cudabûna



mezheb bêtir mifa standine û Kurd bi her du çekên cudabûna mezheb û netewe hatine serkûtkirin û qirkirin. Bi taybetî di çaxê desthilatdariya Sefewiyan de karbidestên impiratoriyê gelek xebitîne ku bi riya mezheb Kurdan di nava xwe bibişêvin(bihelenîn) û bi vî rengî pirsgirêka Kurdan ya netewî jî ji holê rakin. Lê di vî karê xwe de li hemberî evîna Kurdan ya ji bo doza netewî zêde bi ser neketin. Herçend bi hizaran Kurd ji Kurdistanê ber bi Xorasan, Qezwîn, Mazenderan û herêmên din yên Îranê sirgûn kirin, lê nekarîn bi temamî hisên wan yên netewî ji holê rakin.

Li pey kuştina Cefer û Mihemed Axayê bavê wî, Simko ku xuretekî ciwan bû, li ser daxwaz û şiwra rih spiyên eşîreta Şikak, bû cîgirê birayê xwe yê mezin.

Ev di rewşekê de bû ku du hissên niştiman perwerî û tolhildanê di dili û mejiyê Simkoyê ciwan de gelek bihêz bûn.

### 3. Destpêka şoreşa Simkoyê Şikak û sedemên bingehîn

Piştî şoreşa Şêx Ûbeydulahê Nehirî(1880 z), serhilada Simaîl Axayê Şikak di rojhilatê Kurdistanê de şoreşa herî mezin û domdirêj tê hesabandin. Di çaxê vê şoreşê de bû ku kesayetiya tehqîrbûyî ya Kurd wek netewekê, hinekî bişkivî û hissên millî di nava Kurdên vê perça Kurdistanê de zêdetir ji berê zindî bûn. Kurdan karî wek netewe hebûna xwe di hemû Îranê de bidin selmandin û berevajî xwesteka şovînîstên Faris, hurmeta xwe ya civakî û siyasî wek mîrasekî dîrokî biparêzin. Ji bona wê jî nivîskar û dîrokan Kirîs Koçêra, Simkoyê Şikak bi (bavê nasyonalîsima Kurdî) di rojhilatê Kurdistanê de binav dika.

Li gor gotina mezinên Evduyîyan Simko di çaxê şehîbûna Cewer Axa de xurtekî 18-19 salî bûye. Yanî sala ji dayibûna wî 1887 an jî 1888ê zayînî ye. Herwiha Tahirxanê Kurê Simko dide diyarkirin ku dema bavê wî li bajarê Şinoyê hatiye şehîdkirin, temenê wî 42 an jî 44 sal bûye. Simko ku ji aliyê Xalê Mîrzê û mezinên din yên êla Şikak ve wek cîgirê bav û birayê xwe yê mezin hatibû hilbijartin, di dilê xwe de ji bêbextî û nemerdiya desthilatdarên dewleta Îranê, kînek mezin ji wan girtibû. Wek tê gotin Simko di ciwaniya de xurtekî şervan, netirs û di liv û lebatên wî de hissa tolhildanê gelek bihêz bûye. Ji ber wan hemû derd û belayên ku bi ser malbata wan de hatibûn, mirovekî kêr axifitin û xemgîn bûye û gelek bi xwe re ponjiye.

Hissa tolhildanê jî bi sedemên dîrokî ve girêdayî bû.

Simko baş dizanî ku ji bapîrê wî yê mezin(Îsmail Xan) bigire heya birayê wî Cewer Xan tev bi nemedî ji aliyê berpirsyarên dewleta Îranê ve hatine xapandin û kuştin. Ji bona wê baş dizanî ku desthilatdarên Îranî li wî jî nagerin û yê rojekê bela xwe li wî jî biden. Çimkî Simko xwedî hêzeke mezin ya leşkerî bû û wek mezinê eşîreta Şikak di nava Kurdan de mirovekî bi qedir û rûmet bû. Wî dizanî ku Îranî dixwazin wî jî weke bira, bav û bapîrên wî, bikujin.

Lê ferqa di navbera Simko û

bira û bavê wî de, di vir deye ku bîr û rayên Simko

yên siyasî (wek rêber û kesayetiyeke siyasî yê Kurd) ji bo azadî ya Kurdistanê bêtir geş bûn. Çaxê ku cîgirê waliyê Azerbaycanê (Mukerrem el Mulik) di sala 1919'an bi hevkarîya Ermenîyan, bombayek çêkirin û di nava qotiyekê de bi navê şirînî ji Simko re şandin, neyartiya Simko bi dewleta Îranê re derbasî pêvajoyek siyasî û eşkeretir bû. Têkeliya Simko bi du kesayetiyeke Kurd(Ebdulrezaq Bedirxan û Seyîd Teha Gîlanî \_ neviyê Şêx Ûbeydulahê Nehirî) re, şoreşa di bin desthilatdariya Simaîl Xanê Şikak



*Birayê Simkoyê Şikak Ehmed Axayê Şikak bi çend şervanên xwe re li kela Çariyê*

de di rojhilatê Kurdistanê de û heya radeyekê jî li bakurê Kurdistanê, berfirehtir kiriye. Lê wek jêder û şahidên zindî dibêjin Seyîd Teha Gîlanî heya dawiyê bi Simko re nemaye û navbera wan li ser awayê têkeliya bi Inglîzan re, têkçûye.

Kirîs Koçêra di derbarê têkçûna Simko bi dewleta Îranê re dibêje: *"Bi vê hindê re ku Simko kîna xwe ya li hemberî Îranê venedişart, gotibû ku bizava min li dijî Îranê tolhildan jî tede bû, çimkî bav û bapîrên min, xizim û kesên min yên nêzîk û cotek birayên min, tev bi derstê karbidestên Îranê hatine kuştin. Lê bi vê re jî Simko gelek caran behsa vê rastiye kiriye ku armancên şoreşa wî ji bo berjewendiyên netewî bûne û tenê ji bo tolvêkirinê nebûye. Di vê derbarê de Simko gotiye: Hemû kes dizane ku gelê Kurd heya niha çi bi ser de hatiye. Mirovên wan yên mezin yên weke Simaîl Xan û Elî Xan bi şeweyek gelek zalimane ji aliyê Îraniyan ve ji nav çûne. Ez niha ji bo gelê Kurd têkûşînê dikim, lê tolhildana ji zordar û bedkaran hê jî maye û ji bîr nabe..."(4)*

Mîna ku di roja îro de ji bo hemû serokên Kurd eşkera bûye, Simko jî zû pêhesiyaye ku dewleta navendiya Îranê mafê azadî û wekhevîyê heta di nava sinorên Îranek yekgirtî de jî nade gelê Kurd.

Simko ku gelek kes hereketa wî bi bizavek eşîretî û herêmî dihesibînin, li gor pîvanên wê çaxê mirovekî zana bûye û haya wî ji siyaseta Îran û cîhanê hebûye. Simko bi nameya ku bi riya serleşkerê Inglîzî ji Zefer el Dulê re şandû, vê rastiye baştir bi me dide selmandin.



Dîmenek ji kela çariyê

Simko di pareke nameya xwe de dibêje: *"Em pir baş dizanîn ku hinek netewe di cîhanê de hene ku hejmara wan nagehe çaryek(1/4)a Kurdan, lê ew gehîştine xweziyên xwe ku mafê otonomiyê ye. Li Elmanan binêrin ku çawa ev karê han di nava xwe de pêkanîne. Birastî ger netewa Kurd di Îranê de negehîje mafê xwe, êdî mirin û neman jêre baştîre ji jiyana û mayîna. Di vê roja ku em tede dijîn, dewleta Îranê bixwaze an jî nexwaze, em mafê xwe yê otonomiyê dixwazin. Êdî ev xweziya hemû mirovekî Kurde û ji xelkê me re jî jiyaneke nûye..."(5)*

Ev name dide diyar kirin ku Simko mirovekî dûrbîn bûye û ji bo standina mafê rewayê gelê Kurd bi armancên mezin û pîlanên nû dest bi xebata xwe ya siyasî kiriye. Herwiha tenê naveroka vê nameya dîrokî (ku bêgoman di arşîva milliya Îranê de hatiye parastin) ji bo wan nivîskar û lêkolîvanên şovenîst ku tenê bi awaykî nîgatîv behsa kesayetiya siyasî û serhildana Simkoyê Şikak kirine û hêjî dikin, baştirîn belgeye ji bo selmandina derew û boxtanên ku wan li ser serok û bizavên Kurdan yên azadîxwaziyê nivîsandine.

#### 4. Destpêka şerên giran

Ji bilî wan şerên biçûk ku di navbera hêzên Simko û Îranê de qewmîne, çend şerên mezin ku bûyera wan di dîroka rojhilatê Kurdistanê de cih girtiye, girîngîn. Ji wan şerên girîng: şerê girtina bajarê Urmiyê, şerê Gulmanxane(li bakurê rojhilatê gola Urmiyê), şerê Miyanduab 1922, şerê Şekeryazî, şerê Sarî Tac, şerê azadkirina Mihbadê û şerê kela Çarî ku mezintirîn şerê serhildanê tê hesibandin.

Li ser çêbûna şerên ku navê wan hat, bêgoman lêkolîneke berfireh pêwîste. Lê di vê nivîsê de ezê bi kurtî behsa şerên serhildana Simko bikem:

Piştî ku hêzên Kurdan bajarê Urmiye ji destê leşkerên Îranê derxistin, Urmiye wek paytexta desthilatdariya Kurdan hat hilbijartin û Teymur Axayê Şikak ji aliyê Simko ve

bi hakimê bajar hat wezîfedar kirin. Di şerê Gulmanxane de jî hêzên Kurdan bi girtina Gulmaxanê rêya ku bajarê Urmiye bi Tebrêzê ve girê dida, girtin. Di şerê Şekeryazî de jî fermandarê hêza dewleta Îranê Emîr Erşed hat kuştin. Emîr Erşed birayê Mihemed Husên Xanê Zerxam(Qeredaxî) bû ku di sera xwe de Cewer Axa kuştibû. Lê di dawiyê de Kurdan nekarî li hemberî hêzên dewletê li berxwe biden û bajarê Urmiyê ku bi qasî çar salan di dsetê Kurdan de bû, ket jêr desthilatdariya hêzên Îranî. Di şerê Miyanduabê de Kurdan bi şikênandina hêzên artêşa Îranê, serkeftinên mezin bi dest xistin. Lê karê herî girîng û dîrokî kuştina xayîne navdar Xalo Qûrban bû. Xalo Qûrban ku ji Kurdên Hersînê ye, yek ji wan fermandarên şoreşa Mîrza Kuçik Xanê Cengelî bû ku li dijî dewleta navendiya Îranê li bakurê Îranê serî hildabû. Xalo Qûrban bi hevkarîya cotkar û çend fermandarên din yê mîna Kerîm Xan, Xalo Hişmet û Baba Xan karî di nava bizava Cengeliyan de heya pileya komîsîriyê jî biçê. Lê piştî Xalo Qûrban ji Mîrza. K. Xanê Cengelî qetîya û di bazara xwefirotinê de ket xizmeta artêşa Riza Pehlewî. Xalo Qûrbanê Kurd, bi hevkarîya artêşa Îranê karî şoreşa Cengeliyan toşî şikestê bike û di dawiyê de serê serokê şoreşê bi xelat ji Riza Xanê Pehlewî re bir kûşika Tehranê. Li hemberî vê xizmeta wî ew bû femandarekî artêşa Îranê.(6)

Xiyaneta Xalo Qûrban ku ji gelê Kurd re mîna deqeke reş û teji şermizariyê bû, berdewam bû, heya dema ku Riza Şahê Pehlewî ew şand meydana şerê li dijî serhildana Simkoyê Şikak. Lê vê carê di şerê Miyanduabê de ev xayîne xwefiroş bi destê şervanên Kurd hat kuştin û nekarî xiyaneta xwe ya rûreşane bidomîne. Cihê şanaziyê bû ku xayînekî Kurd bi destê şervanên serokekî Kurd hatibû kuştin.

Di şerê azadkirina bajarê Mihabadê de fermandarê giştîyê şer Simko bixwe bû ku Seyîd Teha Şemzînî(Gîlanîzade) jî hevkarê wî bû. Piştî şerekî giran bajar ket destê Kurdan û 600 jandarmên Îranî ku di bin serokatiya major Melîkzadeh de bûn, tev hatin kuştin. Di çaxê şerê (Sarî Tac) de jî ku li sala 1922'an li herêma Selemas(Dîleman) qewimî, hêza Kurdan nekarî li hemberî hêzên Îraniyan berxwedanê bike. Şer heya dagîrkirina kela Çariyê berdewam bû. Piştî ku kela Çariyê hat girtin, Simko û hizar kes ji siwarên xwe re derbasî bakurê Kurdistanê bûn û ji aliyê artêşa Tirkîyê ve hatin bêçek kirin. Lê ev ne dawîya şerên Kurd û dewleta Îranê bûn.

## 5. Şehîd bûna Simkoyê Şikak ( Bajarê Şino 30.06.1930)

Siyaseta ku Riza Xanê Pehlewî di nava Kurdan de dida meşandin û mixabin di vê siyaseta xwe de jî biser ket, ew bû ku bi riya pere û dirav axa û serok eşretên Kurd ji bo aliyê dewletê dikişandin. Heta li ser şehîdbûna Simko jî goman heye ku hinek axayên Kurd xiyanet li wî kirine û ew neçar kirine ku ji bo hevdîtinan xwe bigehîne bajarê Şinoyê. Berdevik û desthilatdarên Îranê ku hertim bi riya xapandin û xiyanetê xwe nêzî siyasetvanên Kurd kirine, dîsa jî bi navê hevdîtinên çareseriyê, Simko hat razîkirin ku bê bajarê Şinoyê û bi serleşker Muqedem re hev bibînin. Ji bona wê jî wan bi rêya Teymor Axa ku demek bû bu birîndarî di destê dewletê de hêsîr bû, nameyek ji Simko re şandin ku wê demê li gundê Barzan bû. Simko bi çend siwarên xwe re hatin çiyayê Qendîl û li wir jî bi Xurşîd Axayê Herkî re ber bi bajarê Şinoyê meşyan. Li wir femandê bajarê Şino serheng Sadiq Xanê Nûrozî ew bir mala xwe. Lê hatina serleşker Muqedem derew bû û ew li benda defetekê bûn ku Simko bi tenê bikişînin dervey bajarê Şinoyê û wî li wir bikujin. Di dawiyê de jî bi henceta pêşwazî kirina ji serleşker Muqedem li dervey bajarê Şinoyê bi wê davika ku jêre danîbûn, di êvarîya 30.06.1930 de hat şehîd kirin. Herçend di şer de Simko û siwarên wî gelek kes ji serbaz û leşkerên dewletê jî kuştin, lê wî nekarî vê carê xwe ji destê wan rizgar bike. Termê Simkoyê sê rojan li bajarê Urmiyê neveşartî danîn ku gel lê binêre û Kurdan jî pêbihesinin ku serokê wan hatiye kuştin. Berpirsyarên dewleta Îranê ji bo

zanîna wê hindê ku sedî-sed bizanîbin Simkoyê Şikak kuştine, jina Simko ya bi navê Fexriye Êqibalî (Azerî bû) anîn ser termê wî û wê jî bi nerihetî ji wan re got: "Belê ev mêrê min Simaîl Axa ye. Ez ji rûyê tiliya wî ya birî dizanim ku berî çend salan ji ber jehra marê ku pêvedabû, bi destê xwe bi kêra xwe biribû..."(7)



Êvariya roja 30.06. 1930 li bajarê Şîno termê qehremanê dîroka azadîxwaziya Kurdistanê Simkoyê Şikak li ber piyên leşkerên Îranê ye

Dema ku xebera kuştina Simko gehişt kûşka paşatiya Îranê heya heftiyekê şahî û kêfxweşî hatin lidarxistin û hemû kuçe û kolanên bajarê Tehranê bi ronahî û gulan hatin xemilandin. Riza Pehlewî mezintirîn dujiminê xwe di Kurdistanê de ji holê rakiribû.

Tirajediya ji navçûyîna malbateke mîna malbata Simaîl Xanê Şikak tiştêkî hêsan nîne ku di dîrokê de bê ji bîrkirin. Malbata ku ji bo doza Kurdistanê gelek bedelên mezin pêşkêş kirin. Bi awayekî ku heta roja îro jî desthilatdarên komara meleyên cinayetkar ji hurmet û giraniya malbata Simko di nava Kurdan de ditirsin. Şehîdbûna qehremankî mîna Simko bû sedem ku heya pêkhatina komara Kurdistan ya di bin serokatiya Pêşewa Qazî Mihemed de (li sala 1946an), bêdengiyek xemgîn li rojhilatê Kurdistanê hakim be.

## 6. Di dîroka Kurdistan ê de çend xalên girîng ji destkeftinên şoreşa Simkoyê Şikak

**A.** Simko di çaxê desthilatdariya xwe de gelek xebitiye ku bi dewletên biyanî re têkeliyên siyasî pêkbîne. Di vê navê de bi taybetî ew xebitiye ku bi dewleta Inglîstan û Sovyetistana berê re têkiliyan deyne û bala wan bo ser çareserkirina pirsgerêka Kurd bikişîne. Lê wan ji ber berjewendiyên xwe yê aborî û girîng nebûna cihê jeopolîtîk yê axa Kurdistanê, bihayekî wisa nedane pêşniyarên vî serokê Kurd. Simko bi riya Seyîd Teha Gîlanîzade(Şenzînî) pir xwestiye ku ji bo çareserkirina pirsgerêka Kurd û pêkanîna dewleteke Kurdî bi berpirsyarên Inglîz li Îraqê hevdîtinan pêkbîne, lê di vê daxwaza xwe de bi ser neketiye. Herwiha ew ji Şêx Mehmûdê Berzencî bi gilî û gazince bûye ku baweriya xwe bi dewleta Tirkan re tîne. Ji bona wê jî ew di derbarê Inglîz û Tirkan de wiha dibêje: "Inglîz û Tirk herdu ji bo çareserkirina pirsgerêka



*serxwebûn û serbestiya Kurdistanê derewan di gel me de dikin, ew me dixapînin. Inglîz dixwaze tevaya Kurdan mîna xulam û berdeyan ji bo armanc û daxwazên xwe yên çewit bikar bînin û bixebitînin, mîna meymonan me ji xwe re bireqsînin û ew jî bi me bikenin. Ew dixwazin me li hemberî netewa me şermezar biken, ev ne karê min e, ez xiyaneê li gelê xwe nakem.*

*Tirk û Inglîz herdu ji hev xirabtirin, lê ji herkesî zêdetir Kurd ji bona xwe xirabin, Kurd piştê hev nagirin, hînî xizmetkariyê bûne, baweriya wan bixwe tune û mezinatiya hevdu napejirînin.”(8)*

Simko bêtirî hertiştî ji xiyaneeta axa û begên Kurd dilşikestî bû ku di rojên xweş de mîna mêşa li dora şîrînî, kêliyekê ji wî dûr nediketin, lê di rojên tengaviyê de xwe ji wî dûr dixistin.

**B.** Xaleke din ya herî girîng ew karên rewşenbîrî û kulturîne ku Simko di çaxê desthilatdariya xwe li bajarê Urmiyê dan meşandin. Yekemîn car di dîroka rojhilatê Kurdistanê de Simko ket wê fikirê ku di warê ragehandinê de jî pêngavek bê avêtin. Sala 1912 li bajarê Xoy Abdulrezaq Bedirxan bi piştgîriya siyasî û diravî ya Simkoyê Şikak kovarek mehane bi navê (Kurdistan) weşand. Herwiha li bajarê Xoy dibistanek Kurdî jî ji bo zarokên Kurd vekirin ku ev du karên han kîna desthilatdarên Îranê li dijî Kurdan gelek bilind kiriye. Salên piştî şerê cihanî yê yekemîn yanî ji sala 1919’an heya têkçûna şoreşê rojnameya bi navê (Roja Kurd) û piştê tenê bi navê (Kurd) ku organa fêrmiya dewleta wî bûye, hatiye weşandin. (Roja Kurd) an jî (Kurd) rojnameyek heftane bûye. Sernivîserê vê rojnamê nemir Mela Mihemedê Turcanî zade bû ku karê amadekirina rojnamê di weşanxana Xêyret de li bajarê Urmiyê dimeşandin. Herwiha Simko ji bo agehariya ji rewşa siyasî û leşkeriyê hemû herêmên di bin desthilatdariya xwe de, ji telefonê mifa standiye û bi vî awayî pêwendiyên hemû fermandarên eniyên şer bi kela Çariyê re hebûne.

**C.** Beriya ku Simko bi awayekî berfireh dest bi şer û şoreşa li dijî dewleta Îranê bike, bi hevkarîya Abdulrezaq Bedirxan û çend giregirên din yên Kurd komelek bi navê (Cîhandanî) li bajarê Xoy damezrandibûn ku komelek rewşenbîrî bû û bêtir xebatên çandî û rewşendîrî dimeşandin ku di xala B de behsa hinek ji wan karên girîng bi kurtî hat kirin.

**D.** Simko pir xebitiye ku bi kesayetî û bizavên ku li dijî rijîma Îranê serî hildane, têkeliyên siyasî deyne. Ew bi şoreşgerê Azerbaycanî Mihemed Xiyabanî re di nava peywendiyên de bûye. Herwiha Simko û serdarê şoreşa bakurê Îranê Mîrza Kuçik Xanê Cengelî xebitîne ku di navbera şoreşa Kurdistan û bakurê Îranê(Gîlan) de dan û standinên siyasî pêkbînin, lê gûherandinên siyasî ev derfet nedaye wan ku vî karê dîrokî bigehînin encamê.

## **7. çend kêmasiyên bizav û serhildana Simkoyê Şikak**

Di nava Kurdan de rexneya herî zêde ku ji kesayetiya Simkoyê Şikak tê kirin, kuştina Mar Şîmûn rêberî olî û siyasîyê Asûriyên Hekarê ye. Lê di vê derbarê de gelek lêkolînên berfireh û bêalî pêwîstin ku sedemên sereke yên vê bûyera dîrokî bînin eşkera kirin. Aya di navbera Kurd û Asûriyan de çî sedemên siyasî, olî û civakî di wê serdemê de hebûne ku Simko biryara kuştina Mar Şîmûn daye? Di vê derbarê de dîtînin cuda ji hev hene ku yek ji wan jî dîtîna mezinên Şikak bixwe ye. Ew ji bo vî karê serokê Kurd Simko sedemên siyasî û olî bêtir destnîşan diken. Bi her awayî ev karê Simko bûye sedem ku gelê herêmê(bi taybetî piştî kuştina wî li Şîno) dilsariyekê

li hember vî karê wî bidin xuyakirin. Di derbara vê xala girîng de lêkolînek berfireh pêwîste ku sedemên bingehîn ji bo vî karê Simko bîn eşkere kirin.

Simko xwedî hêzeke leşkerî ya pir mezin bû. Hejmara pêşmergeyên wî carna gehîştîya 20.000 kesan. Lê mixan tevaya van şervanan mîna artêşeke hevgerî û di bin ala partiyeke siyasî de xebata xwe nekirine. Her eşîrek di bin serokatiya mezinekî wê eşîretê de bûye û rengêkî taybetî ji bo nasandina eşîret û hêza xwe hilibjartine. Bo nimune rengê ala hêza di bin serokatiya Simkoyê Şikak de sor bûye(9).

## 8. Mêranî û mêvanperweriya Simkoyê Şikak û nemerdî û xiyaneta Riza Şahê Pehlewî



*Ji aliyê rastê: Simkoyê Şikak, Xosiruyê kurê wî, Suleyman Şefîq Paşa  
Du kesên li ser piyan nehatin nasandin*

Riza Mîrpenc ku bi hevkarîya Ingîlzan ji pileya serleşkeriyê bû şahê Îranê, di sala 1925an de ji bo serlêdanekê çû Azerbaycan û Kurdistanê. Armanca wî ya herî mezin ew bû ku riyekê ji bo bi dawî anîna serhildana Simko peyda bike û desthilatdariya xwe li hemû Îranê birêk bike. Serleşkerên Îranî pir dawa ji Riza Şahê Pehlewî kirin ku dev ji vê sefera xwe berde, lê ew razî nebû û xwest ku ji nêzve Simko bibîne. Xuyaye ku hemû di wê baweriyê de bûn ku Riza Şahê Îranî ji wê seferê venagere û yê bi destê Simkoyê bê kuştin. Dema ew bi 62 kes ji fermanîdar û hêza xwe ya taybetî ve nêzî bajarê Selmasê dibe, di yekemîn dîtin de 5000 siwarên Simkoyê Şikak bi rûyekî sar û girîng pêşwaziyê li şahê Îranê diken û rêzek taybetî jêre nedigirtin. Simko jî wek serokekî Kurd bi kincên Kurdî li hemberî şahê Îranê sekinî û bi pêşwaziyek sar û bi serê lêvê bixêrhatina wî kir. Piştê herdu bi hev re çûne karwanserayekê û li ser pirsgerêkê herêmê axivîn. Wek tê gotin Riza Şahê Pehlewî pir tirsîyabû ku Simko wî û hemû kesên wî bikujin. Ji bona wê jî heya berê sibê ji tirsê nerazabû û êdî dest ji jiyana xwe şûştibû. Ew herdem li benda wê hindê bû

ku siwarên Simko hêrişî wan biken û tevda bîn kuştin. Herçend piştî ewqas bûyerên tal ku Simko bi çavên xwe dîtibûn, êdî bawerîya wî bi desthilatdarên Îranê nemabû, lê derfetek dîrokî ji dest da û wê şevê Riza Şahê Pehlewî nekuşt û ew ji destê wî filitî. Simko piştê di hevdîtinê ya bi serleşker Ebdulah Tehmasibî re gotibû: "Mezintirîn şaşîya min di wê şevê de ew bû ku min Riza Şahê nekuşt". Wê şevê Riza Şahê Pehlewî ji serleşker Tehmasibî dawa kir ku karekî biken û Simko mijûl be û çax derbas be û roja din zû ji wir ber bi Urmîyê hereket biken. Wan bi lîstika textê nêzî wê şevê Simko mijûl kirin û roja din Simko pêhesiya ku Riza Şahê Pehlewî ji destê wî derketiye û derfetek zêrîn ji destê xwe daye.(10)

Demê ku Riza Pehlewî bi hevkarîya hêzên biyanî desthilatdariya xwe li herdera Kurdistanê bihêz kir, bi awayê ku li jor hat gotin ji bo hevdîtinên siyasî Simko vexwendin bajarê Şinoyê û li wir ew bi bêbextî hat kuştin.

Gelo ger di serdana Riza Pehlewî ya bo Kurdistanê ew bi destê Simko bihata kuştin, rêya(mesîrê) dîroka Îranê yê bihata gûherandin an ne?!

Bêgoman yê gelek gûherandinên siyasî çêbibûna, lê wek me dît Simko bi ji dest dayîna derfetek mezin bû sedem ku piştê Riza Pehlewî bi nemerdî wî bikuje.

Eviya netîce û berhemê mêvanperwerî û merdayetiya Kurdan bû û piştê komkujiyên her du şahên Îranê li rojhilatê Kurdistanê pêkanîn jî bersiva mêvanperweriya serokên gelê Kurd bûn!!.



*Kela Simaîl Xanê Mezin (bapîrê Simko yê mezin, bavê Elî Xanê bapîrê Simko) li nêzê çemê Baranduzê li herêma Urmiyê. Kela wek şûnewarekû dîrokî di nava Kurdan de weke ziyaretgehekê tê hesabandin*

## 9. Navê Simko di nava beyit û stranên Kurdî de

Li ser jîyan, derd û elemên malbata Simkoyê nemir heya niha gelek dengbêj û hunermendên navdar beyit û stran gotine. Bi riya van stranên jî mirov dikare malwêranî, ked û zehmetiyên ku vê malbata mezin ji bo doza bi şan û şerefa Kurdistanê kişandine, bibîne.

Hunermendê mezinê Kurd Kawîs Axa ku di dîroka hunera Kurdistanê de yekemîn hunermendê siyasîbêjê Kurd tê hesabandin, di qalibê lawikekê de li ser şehîdbûna lîderê Kurd Simkoyê Şîkak hissên xwe wiha tîne ziman:

*Lê dayê, lê dayê, lê dayê, şereka qewimî li Şinoya wêran bira çi mezine  
Ewro emirê Taranê hatiye bo qumandarê Şinoyê, li niwêjê mexiribê  
Bi tirimbêla, axawo, eskerên xwe hînbûne yo, yo, yo, li niwêjê mexiribê  
Bi tirimbêla eskeran xwe hînbûne, babê Xusro bi sê denga gazdike:  
Babê Feysel, ewroke dest helîne, ciwabekê biben eşîrê Ebduyiya, ewro  
Hatime kuştinê danên şûna min Xusiro zaroye axawo ciyê mine*

*Lê dayê Mihteberê rebenê, Gulîzarê nemayê, Mirariyê rebenê, niwêjê  
Mexiribê dengê sê tîran û metrelozan agir berda vê dinyayê, kesê xêrxwaz  
nebû ciwabekê bie eşîreta Herkiya, paşî babê Xusiro tovê egîdan li me  
qeliya, wî kes nema axawo li dinyayê, ezê di heyfa kuştina babê Xusiro  
nîme ewro şahî û govende li naw ecemê Kerbelayê.....*

.....

Strana jêr jî ji aliyê dengbêjê navdar Birê hatiye gotin ku têde behsa kuştina Cewahir xanima jina Simkoyê Şîkak jî bi destê leşkerên dewleta Îranê tê kirin:

„ Bê de wey lê, wey lê, wey lê

*Lê lê Muhteberê rebenê, eskerê kişiya ji Dilemanê  
Eskerê Heyder Paşa xwe da lo gulîzerê, kekê Xosiro paşê Kurda  
şer xweş kiriye lo ser Îranê  
De wey lê, wey lê, wey lê, wey lê, wey lê her bê de wey lê*

*Lê lê Muhteberê rebenê wezê bi Şawiliya kawil ketin li vê fêzê  
Sibeye kekê Xosiro, Paşê Kurda ji mal siyar bû, esker li pey  
Kete du rêzê  
Kekê Xosiro, Paşê Kurda şer xwe kiriye lo ser Tewrêzê  
De wey lê, wey lê, wey lê, wey lê, bê de wey lê lê lê  
Muhteberê rebenê wezê Şawiliya kawil ketim lo dev beyara  
Ji sibê de ser kekê Xosiro Paşê Kurda tê dengê gûla, topa, wan teyara  
Ehmed Begê sê denga gazî dikir : Gelî cahêla çêbin, çê bixebitin, wexta  
Indada me derê kekê Xosiro, paşê Kurda, gulla siyara  
De wey lê, de wey lê, lê lê Muhteberê rebenê wezê  
Şawiliya kawil ketim di çe îlê(çalê) da  
Ji sibê da eskerê Heyder Paşa dikişiya ser Xosiro, paşê Kurda lo pêda, pêda  
Ehmed begê gazî dikir: Kesek tune, cabekê bide kekê Xosiro, Paşê Kurda, Muhteber  
xanim kuştin, Xosiro Beg lo girtin di xewa sibê de”  
De wey lê, de wey lê, de wey lê, de wey lê....”*

#### **Jêder û çavkanî:**

1. Tarîxê Iran\_ Elhedîs we elmuasir\_ Dr. Kemal Mezher
2. Hevpeyvîn bi apê Evdî pêşmergê re. Urmiye 1993
3. Tarîxê 18 salêyê Azerbaycan\_ Ehmed Kesrewî( Bi zimanê Farsî)
- 4 û 5. Bizava netewiya Kurd \_ Kirîs Koçêra bi zimanê Farsî
6. îsmail Axay Şikak w bizwtinewey netewayetî Kurd \_ Mamosta Mihemed Resûl Hawar
7. Hevpeyvîn bi Qûbad Simko re ( Kurê Simkoyê Şikak).
8. Ehmed Teqî w yaddaştekanî ew \_ Bi zimanê Kurdî(zarava Soranî)
9. Hevpeyvîn bi Dr. Cebar Qadir re.
10. Bîranînên Riza Refîi ( Qayîm Meqam el Mulik) endamekî parlamana Îranê di çaxê Riza Şahê Pehlewî de.

Têbînî: Ev nivîs dê di pêşerojê nêzîk de bi awayekî berfirehtir di pirojeya min ya bi navê ( Jiyana 50 Navdarên Kurd ) weke pirtûkek taybetî bê weşandin.